GÜNEYDOĞU GAZETECİLER CEMİYETİ

# CEMÎYETA ROJNAMEGERÊN BAŞÛRÊ ROJHILAT

## DI PÊVAJOYÊN AŞTIYÊ DE BÎRA MEDYAYÊ: NÊRÎNA EWROPAYÊ

## ENCAMNAMEYA PANELÊ

**16 Gulan 2026**

**Stockholm / Swêd**

**CEMÎYETA ROJNAMEGERÊN BAŞÛRÊ ROJHILAT (GGC)**
**DI PÊVAJOYÊN AŞTIYÊ DE BÎRA MEDYAYÊ: NÊRÎNA EWROPAYÊ**

**Encamnemaya Panelê**

**16ê Gulana 2026an -Stockholm / Swêd**

Di panela bi navê "**Di Pêvajoyên Aştiyê de Bîra Medyayê: Nêrîna Ewropayê**" ku ji aliyê Cemîyeta Rojnamegerên Başûrê Rojhilat (GGC) ve li Stockholmê, paytextê Swêdê hate lidarxistin de; fikar, daxwaz, rexne û pêşniyarên diaspora Kurd a li Ewropayê bi awayekî berfireh hatin nîqaşkirin. Rojnameger, akademisyen, siyasetmedar, nûnerên diasporayê û beşdarên ku di panelê de axivîn; destnîşan kirin ku divê pêvajoya heyî ne tenê di çarçoveya ewlehiyê de, lê belê bi rûyên wê yên dîrokî, civakî û demokratîk jî bibe rojev.

Di encama nêrînên hevpar ên ku li seranserê panelê hatin anîn ziman de, ev nirxandinên jêrîn derketin pêş:

**1. PERSPEKTÎFA  DIYASPORAYÊ**

Gelek beşdarên ku li ser navê diyasporayê axivîn diyar kirin ku meseleya Kurd nikare tenê wekî pirsgirêka "çekberdanê" yan jî "ewlehiyê" bê destgirtin. Hat destnîşankirin ku meseleya Kurd pirsgirêkeke dîrokî, siyasî û civakî ye; heta ku daxwazên nasname, ziman, çand û statuyê neyên dîtin, çareseriyeke mayînde nayê avakirin.

**2. NÊRÎNÊN DIYASPORAYÊ YÊN LI SER PÊVAJOYA HEYÎ**

Yek ji sernavên ku ji aliyê nûnerên diyasporayê ve bi hêz hate ziman, rexneyên li ser nezelalbûna rêveçûna pêvajoyê bûn. Beşdaran diyar kir ku civak di derbarê pêvajoyê de bi têra xwe nayê agahdarkirin û raya giştî neçar dimîne ku geşedanan tenê di ser daxuyaniyên sînordar re bişopîne. Fikarên cidî hatin ziman ku naverok, armanc û destkeftiyên demokratîk ên pêvajoyê bi zelalî nayên eşkere kirin. Nûnerên diyasporayê destnîşan kirin ku divê civak bibe aktora vê pêvajoyê û gotin ku bêyî tevlêbûna demokratîk, hevdîtinên ku tên kirin nikarin baweriyeke civakî ava bikin.

**3. DI MAFÊN BINGEHÎN DE TÊ ÇAVÊRÊKIRIN KU GAVÊN ŞÊNBER BÊN AVÊTIN**

Li seranserê panelê gelek beşdaran anîn ziman ku heta îro di warê mafên bingehîn ên Kurdan de gavên berbiçav û pêbawer nehatine avêtin. Mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê, bikaranîna Kurdî di jiyana giştî de, misogerkirina mafên çandî di bin sîwana destûra bingehîn de, rewşa girtiyên siyasî, sepanên qeyûman û mafê temsîliyeta

demokratîk sernavên herî zêde hatin ziman bûn. Nûnerên diyasporayê destnîşan kirin ku bêyî avêtina gavên berbiçav, hewayeke baweriyê di nav civakê de ava nabe.

**4. ZIMAN Û NASNAME**

Di panelê de bi taybetî li ser meseleya ziman û nasnameyê nîqaşên gur hatin meşandin. Beşdaran diyar kir ku tunebûna zimanê Kurdî di qada giştî de dibe sedema şikestinên çandî yên giran di nav civakê de. Hat destnîşankirin ku her çend beşeke mezin a diaspora Ewropayê hewl dide zimanê xwe di bin şert û mercên diyasporayê de biparêze jî, nebûna statuyeke wekhev ji bo zimanê Kurdî pirsgirêkeke mezin e. Hat gotin ku divê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û bikaribe di jiyana giştî de cih bigire.

**5. FIKARÊN KURDÊN DIASPORAYÊ**

Gelek nûnerên diasporayê fikarên xwe anîn ziman ku pêvajo bi giranî yekalî bi pêş ve diçe. Beşdaran diyar kir ku mijarên bêçekkirin û rawestandina şer derdikevin pêş, lê di warê daxwazên demokratîk ên Kurdan de pêşveçûneke rasteqîn nayê dîtin. Hat destnîşankirin ku bêyî avêtina gavên şênber di warê demokratîkbûn, garantiya hiqûqî û mafên siyasî de, pêvajo dê di hilberandina piştgiriya civakî de rûbirûyî zehmetiyan bibe. Hat diyarkirin ku berdewamiya girtina girtiyên siyasî, girtiyên nexweş, sepanên qeyûman û zextên li ser qada demokratîk zerarê dide baweriya civakî.

**6. DIASPORA WEKÎ PARÇEYEKÎ GÎRÎNG Ê HAFIZEYA KURD TÊ DÎTIN**

Hate teqezkirin ku diaspora Kurd ne tenê civateke ku ji derve ve li pêvajoyê temaşe dike ye; di parastina ziman, çand û hafizeya civakî ya Kurdî de xwedî roleke girîng e. Hat destnîşankirin ku diyaspora bi taybetî di warê zindîhiştina zimanê Kurdî, domandina xebatên çandî, pêşxistina qadên nîqaşên demokratîk û avakirina raya giştî ya navneteweyî de giranbiha ye. Her wiha hat gotin ku divê diyaspora bi awayekî aktîf di nav pêvajoya çareseriya demokratîk de cih bigire.

**7. ZIMAN Û HELWESTA MEDYAYÊ JI BO AŞTIYA CIVAKÎ DIYARKER E**

Rojnameger û nûnerên medyayê rola medyayê ya di serdemên şer û pevçûnan de bi awayekî berfireh nirxandin. Beşdaran diyar kir ku weşangeriya ku bi salan zimanê polarîze, hedefgirtin û nefretê hilberandiye, birînên civakî hîn kûrtir kirine. Li dijî vê yekê hate destnîşankirin ku divê rojnamegeriya aştiyê bê xurtkirin û medya di navbera gelan de ne dijminatiyê, bibe sedema diyalogê. Hat teqezkirin ku rojnameger şahidên ku hafizeya civakî diparêzin in û xuyakirina rastiyê ji bo çareseriya demokratîk jiyanî ye.

**8. DAXWAZÊN JIBO RÊZIKNAMEYÊN HIQÛQÎ**

Li seranserê panelê ji aliyê beşdaran ve hate destnîşankirin ku ji bo pêşveçûna pêvajoya heyî divê zemîna hiqûqî û demokratîk bê xurtkirin. Bi taybetî nûner û

axivêrên diyasporayê diyar kirin ku tenê nîqaşên li ser çekberdanê têrê nakin û ji bo çareseriya demokratîk rêziknameyên qanûnî yên şênber mecbûrî ne.

Divê qanûneke çarçove ya eşkere, zelal û ewlekar ku pêvajoya çekberdanê birêve bibe, bê amadekirin.

Ji bo kesên ku di nav pêvajoyê de ne, divê qanûnên taybet û rêziknameyên qanûnî yên demkî werin çêkirin da ku garantiya hiqûqî peyda bibe.

Pêwîst e ku rêziknameyên hiqûqî yên di derbarê kesên çek berdane de di bin garantiya qanûnî de bin.

Divê meseleya Kurd ne tenê di çarçoveya polîtîkayên ewlehiyê de, lê bi perspektîfa çareseriya demokratîk û siyasî bê girtin dest.

Ji bo ku bêbaweriyên di pêvajoyên borî de dubare nebin, divê rêziknameyên qanûnî li ser bingeha lihevkirina civakî werin amadekirin.

## 9. RIZAYETA CIVAKÎ Û AŞTIYEKE GIŞTÎ

Di panelê de hate destnîşankirin ku aştiyeke mayînde tenê bi rizayeta civakî ya berfireh û bi lihevkirineke rasteqîn pêkan e. Hat diyarkirin ku ev rizaye û paşeroja hevpar a ku were avakirin, divê bi gavên wusa werin hûnandin ku ne tenê dilê Kurd û Tirkan, lê belê dilê her kesê li Tirkiyeyê yê ku bi awayekî rasterast an nerasterast bûye mexdûrê vê pirsgirêka kur, êş kişandiye û berpirsiyarî hîs kiriye, rehet bike û bibe cihê qebûlkirina wijdanî. Wekî rûyê hevpar derket pêş ku lihevkirineke rastîn tenê bi girtina ber çavan a hestiyarî û rizayeta hemû beşên ku ji pirsgirêkê bandor bûne, dikare pêk bibe.

## 10. ENCAM Û DAXWAZ

Di encama panelê de ji aliyê nûnerên diyasporayê, rojnameger û beşdaran ve daxwaz û pêşniyarên jêrîn derketin pêş:

1. Divê meseleya Kurd ne tenê bi polîtîkayên ewlehiyê, lê bi perspektîfa çareseriya demokratîk û siyasî bê destgirtin.
2. Pêvajo divê bi awayekî zelal bibe rêve û civak bi rêkûpêk were agahdarkirin.
3. Nasnameya Kurdan divê bibe xwedî garantiya destûra bingehîn.
4. Mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê divê were naskirin û rêziknameyên qanûnî yên pêwîst werin çêkirin.
5. Rê li ber bikaranîna Kurdî ya di jiyana giştî de divê were vekirin.
6. Rêziknameyên qanûnî yên derbarê pêvajoya çekberdanê de divê bi rengekî ku baweriya civakî ava bike werin amadekirin.
7. Divê dawî li sepanên qeyûman bê anîn û rêz li vîna gel bê girtin.
8. Di warê girtiyên siyasî û girtiyên nexweş de divê gavên demokratîk û hiqûqî werin avêtin.

9. Têgihîştina rojnamegeriya aştiyê divê bê xurtkirin; zimanê nefretê û weşangeriya polarîze divê bibe paşeroj.
10. Nûnerên diyasporayê divê bibin parçeyekî aktîf ê nîqaşên çareseriya demokratîk.
11. Divê rûbirûbûna binpêkirinên mafan ên di raboriyê de pêk bibe û xebatên parastina hafizeya civakî werin piştgirîkirin.
12. Vegera mirovên ku di demeke berê ji ber sedemên curbecur ên siyasî neçar mane koç bikin û di sirgûnê de (li diyasporayê) dijîn, divê di nav çarçoveya pêvajoyê de were girtin dest û rêziknameyên hiqûqî yên pêwîst werin çêkirin.
13. Ji bo aştiyeke mayînde divê rizayeta civakî bibe pêşeng; gavên ku werin avêtin divê ne tenê ya Kurd û Tirkan, dilê her kesê ku mexdûr û xwedî xema vê mijarê ye, rehet bike.

**Wekî Cemîyeta Rojnamegerên Başûrê Rojhilat (GGC); em bi rêzdarî ji raya giştî re radigihînin ku ji bo gel bikaribin di paşerojeke aştiyane, wekhev û azad de bijîn, em ê li gel diyaloga demokratîk, rastiyê û rojnamegeriya azad cih girtina xwe bidomînin.**

GÜNEYDOĞU GAZETECİLER CEMİYETİ